

## weke min ew dîtiye

Nûşîn Bêcirmanî

**B**erî demekê, nûnerê weşana **Newrozê** hevpeyvînek bi Mihemed Emînê Derwêş (B.Egîd) re kiribû, tê de, wî ronî dabû ser destpêka xebata xwe di hundurê tevgera kurdî de li Sûriyê, lê mixabin berî belavkirina wê hevpeyvîne, ew kesayetiya niştimanî û rewşenbîrî çû ber dilovaniya xwedayê xwe. Di 30/10/2008an de, girûpa Dêrikê ya çanda kurdî çilrojîya wî li darxist û nûnerê Newrozê hate vexwendin, di wê çilrojîyê de gotinek xwend. Wî hin nerîn û hilwestên xwe sebareti buhuştî anîbûn zimên. Niha, emê hin ji pirs û bersivên wî ji xwendevanên Newrozê re belav bikin.

Mamê Mihemed Emîn: em xêrhatina te dikin, gelek dilxweş û şa ne ku vê hevpeyvîne bi te re bikin, em sipasya te dikin ku tevî tendurustiya te ya ne baş jî, te sînga xwe ya fireh ji me re vekiriye da em nêçîrê di baxên çalakiyên te de bikin, mamê delal careke din tu bi xêr hatî mêvanê giranbuha .

P1- Mamo, tu karî xwe ji xwendevanan re bidî naskirin?

B1- Belê, ez Mihemed Emînê Derwêş im, ji gundê Şelal, yê nêzîkî Dêrûna Axê ye. Ez ji wir hatime Dêrikê û bi nivîsandina helbesta kurdî mijûl dibim, hin kurte çîrokên min jî hene.

P2-Tu dikarî ji me re destpêka xebata xwe, di tevgera kurdî de bidî xuyakirin ?

B2-Di sala 1957an de, ez li dibistanê bûm, wê salê( Derwêşê Mele Silêman) hate gund û daxwaza civatekê ji xortan re kir û gote min divê tu jî werî civatê .Hingê ez biçûk bûm. Di sala 1958an de, ez

bûme endamekî Partî û Derwêş komikek li gund ji van endaman ava kir : Şerîf ji Dêrûn Kevinkê, Evdo yê Mihema, Tahirê Mihemedê Mele Tahir, şêxoyê



Himêdî û ez. Gote me divê hun ji bo doza kurdî xebatê bikin û hevalan pir bikin. Me wilo berdewam kir ta ku em bûne komîteke (MEHELÎ) û ez bûme berpirsiyarê wê. Partî li devera Aliya tevî belav bû, serokatîyê jî tu nûçe ne didane me. Lê li gora zanebûna xwe, em ji millet re dipeyvîn û me hestê wî yê netewî bilind dikir. Hingî, agirê şoreşa Kurdistana Iraqê geş û bilind bû. Wê demê, mehanê me çaryek Lîreyê sûrî bû. Xelkê ji me dipirsî: Ma ev pere diçine şoreşê ? . Me bersiv bi erêbûnê dida wan . P3-navin ji berpirsiyarên wê demê têne bîra te gelo?.

B3-Belê, ji wan Derwêşê Mele Silêman, Ebdilhemîdê Derwêş, Mihemedê Mele Neyo, Osman Sebrî, Ebdelayê Mele Elî, Xelîl û Hesen jî hebûn .

P4-Tu wek siyasetmedarekî Kevin , çi şîretên te ji partiyên tevgera kurdî li Sûriyê re hene ?

B4-Divê mirov bi gelê xwe re be, jê hîn bibe û wî hîn bike û gerek bê derengî lêvegera kurdî ava bibe. Eger em hemî dest nedin hev û dilan ji hev re venekin, banga xwe nekin yek, dengê gelê me bilind nabe û her emê di vê gerînekê de bimînin. Bila hemî bi hev re, partî, rewşenbîr, saziyên mafên **D.R ( 4 )**